

Eger pêdiviya we bi parastina navnetewî hebe û hûn xwedîmercê beşdarbûna di bernameya veguhastina YE da bin:

- Ji nûnerê EASO yan UNHCR yan rayedarê Yewnanîstanê re rabigehînin ku hûn dixwazin bo parastina navnetewî û beşdarbûna di bernameya veguhastinê da daxwazê pêşkêş bikin
- Serdana Nivîsgeheka Penaberîya Herêmî ya Xizmetên Penaberîyê bikin, yan
- Bi rêya Skype, pê ID (pênase) ya asylum.service.relocation pêwendîyê bigirin.

Bo bidestana agahiyên bêtir ji bernameyê, serdana www.asylo.gov gr bike û biçe beşa hevdişinê bo tomarkirinê.

‘Veguhastin çîye?’

Veguhastin, cîbecî kirina ev penaberan ku bi zelalî pêdivî bi parastina navnetewî ji Yewnanîstanê bo welatek di yê endamê Ewropa yê. Daxwaza parastina navnetewî tenê di welatê veguhastinê da tê lêkolîn kirin. Veguhastin şêweyek ewle û zagonî ye bo veguhastina penaberan ji Yewnanîstanê bo welatên di yê Ewropî. Çi xerc yan diravdan bo beşdarbûn di ev bernameyê da nayê standin, rûniştandin di maweya pêvajoyê da û veguhastina ji welatê veguhastinê belaş e.



Photo: Andrea Bonetti

Ez dikarim ji kû re bêm veguhestin?

Dikarin ji welateke Ewropî re ku beşdarîya bernameya veguhestinê kirîye, bêne veguhestin.

Gelo hûn xwedîmercê bernameya veguhestinê ne?

Bi mercê hûnê di bernameya veguhestinê da bêne tomar kirin ku hûn penaber bin û bi zelalî pêdivîya we bi parastina navnetewî hebe, paş 24 Marta 2015, hûn ketibine nava Yewnanîstanê, û endamê yek ji welatên Sûriyê, Eritrea, Iraq êbe yan kesek bê wealt be ku pêştir di welatek dî yan di lîsteya netewyên xwedî merc ku her *sê mehan carekê rojame dibe, da rûniştî be.

* welatên ku rêjeya pejirandin û parastina navnetewî a wan di navbera welatên Ewropî di sê mehên bûrî da zêdetir yan hemberî %75 bûye. be.



BALKEŞ

Astên veguhestinê:

- 1) Dibe daxwazekê bo parastina navnetewî di Yewnanistanê da pêşkêş bikin.
- 2) Dibe hûn tevahîya belgeyên berdest bo piştrast kirina kesayetîya xwe û herwisa tevahîya belgeyên radest bûyî ji aliyê Polîsê Yewnanistanê ji xwe re, radest bikin.
- 3) Rastîya gotin û belgeyên ku we radest kirine ji aliyê xizmetên penaberîyê û welatê Ewropî yê veguhestî tê lêkolîn kirin.
- 4) Hertim ku Yewnanistanê ragehand ku welatê Ewropî hûn û endamên malbata we (mêr/jin û zarrok) pejirandine, Yewnanistan tê piştrast be ku hûnê bilez bi rewşa ewle, zagonî û belaş ji vir re bêne veguhestin.
- 5) Biryarr veguhestinê bi nivîskî ji were tê ragehandin.
- 6) Agahîyên taybet bi veguhestinê tê radestî we bibin.
- 7) Dema ku hûn gehîştine welatê veguhestî, daxwaza we bo parastina navnetewî tê bê lêkolîn kirin û pêdivîyên we yê serekê tê bîn çareser kirin.

Ezê bikarim welatê ku jêre bêm veguhestin bijêrim?

Hûn nikarin welatê ku jêre bêne veguhestin bijêrim. Bo girtina biryarrê, heta ku kêrhatî be, babetên taybet têne berçav girtin: pêdivîyên taybetî, rewşa saxlemîya we, pêwendîyên malbatî, şarezayîyên zimanî û herçêşit pêwendîyên çandî û civakî ku gengaze we hebe. Babetên dş jî wekî rêjeya cîyên berdest di welatên beşdarker da jî gengaze bê berçav girtin.

#relocation

- Paş pêşkêş bûna parastina navnetewî ji aliyê welatek Ewropî, dibe bo maweya herîkêm pênc salan di wî welatî da bimînin.
- Hûn nikarin ev welatê Ewropî terk bikin, xênjî ku rayedar izinê bidine we.
- Eger bê izin vir terk bikin, ji welatê ku hûnê jêre hatine veguhestandin, hûnê bêne zivirandin.

Karên jêr nekin:

- dana peran ji bo qaçaxçiyên;
- çûna qaçaxî;
- xistina xwe û malbata xwe bin metirsî û dijwarîyê.

Lîsteya nivsîngêhê penaberîyê ku dikarin serdana wan bikin:

Nivsîngêhên Penaberîyê Herêmî	Kolan
AŦÎNA	2, P. KANELLOPOULOU ST, 10177 ATHENS
SELANÎK	EX KTEO B BUILDING-PONTOU-LAHANAGORA AREA (GREEN GROCERY MARKET) 540 01 KALOHORI, THESSALONIKI
EVROSA JÊR	1B, MAKRIS AVE. 68 100 NEA CHILI, ALEXANDROUPOLIS
EVROS JOR	First Reception Centre, 680 06 FILAKIO, ORESTIADA
RODOZ	1, ELEFTHERIAS SQUARE, RHODOS, TRAFFIC POLICE BUILDING, 85100 RHODES
LESVOS	Nationality Identification Centre, MORIA, 811 00 LESVOS
SAMOS	VATHI, SAMOS

Nivsîngêhên Penaberîyê Lesvos, Xiyos, Samos, Leros, Kos

Map of Greece



Herwisa dikarin bo bîdest anîna agahîyên bêtîr bi rêya jêr gel EASO pêwendîyê bigirin: info@easo.europa.eu



